

Çepgir, dujminên sereke yên nijadperestên

Almanî ne!

»»» R:7



Dîktatortir ji bavê xwe

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (423) 06-06-2022 Buha (1000) Tumen

Dorpêçên Rojavayê yên li dijî
rejîma Îranê

»»» R:4

Çawaniya bersivdana gefên Tirkiyê

»»» R:8

Çi bêwate ye? canê xelkê!

Nêzî du heftî berî
niha û di rêkevt
Cozerdana 1401an a
Rojî de, avahiya Metro-
pola Abadanê herifî;
Piştî wê heyamê rêkev-
ta 14ê Cozerdanê termê
du qurbaniyên din jî
hatine peydakirin.

Heta niha jî paqijki-
rina wê avahiya hatî
herifîn dawî pê ne-
hatiye, û pêka amarên
fermî yên hikûmetî 38
kes di wê bûyerê de
canê xwe ki deşt dane,
lê wek çavkaniyên
nefermî behs dikin, di
dema bûyera karesata
Metropolê de rêjeyek
zêde di nav avahiyê de
mijûlê karkirinê bûn
ku bi sedema vê ku
cihê karê wan germ bû
çûbûne qata nehem ya
avahiyê û heta niha jî
nehatine peydakirin.

Piştî herifîna
Metropolê hin ji ber-
pîrsên pêwendîdar
îtiraf kirin ku di dema
çêkirina wê avahiyê
de hin danûstandinên
bi dizî ve di navbera
xwediyê avahiyê wate
“Husên Ebdulbaqî”
digel bajarvanî û hin ji
berpîrsên hikûmetî yên
wî bajarî û nemaze wê
parêzgehê hebûye da
ku xercê çêkirina wê
avahiyê bo navbirî bê
kêmkirin û di hember
de jî, bertîlek zêde ji
aliyê “Ebdulbaqî” ve



hatîye dan.

Piştî bûyerê û di hey-
amek nêz de ji aliyê
pêwendîdaran ve hate
ragihandin ku xwediyê
avahiya Metropolê
jî di nav avahiyê
de miriye; Încar bi
qebûlandina wê di-
rewê hin ji kesûkarên
navbirî di sarxaneya
yek ji nexwşxaneyên
Abadanê de hate
nîşandan ku bi ser
temekê ve ku rohn
nîne yê kîjan yek ji
qurbaniyên bûyerê ye
li ser wî termî mijûlê
şîn û giriyan kirinê
bûn.

Di şev û rojên wê
karesatê de xelkê
Abadan û paşê jî yên

gund û bajarên din ên herêmê El-ehwazê rijiyane ser şeqaman û wek der-
fetek bo nîşandana nerizayetiyan kombûnî li ser hev li dijî tevahiya deştih-
lata Komara Îslamî silogan dan û “mirin bo Xamineyî” bû silogana sereke
ya xwenîşandanan.

Ev raştiye demekê xwe zêde nîşan da, ku berpîrsên rejîmê xwestin wê bûy-
erê wek derfetekê bi qazancê xwe vebiguhazin û dema ku taziya giştî hate
ragihandin, beşdarbûyên rêûresmê deşt avêtin bi silogandan li dijî rejîmê û
şer û pevçûn di navbera xelkê û hêzên çekdar ên rejîmê de hate deşt pêkirin;
Her eva jî bû ku heta Îbrahîm Reîsî yê binav Serkomarê Îranê piştî derbas-
bûna 11 rojan bi ser bûyerê de û li tîrsa serhildana xelkê û piştî kêmbûna
nerizayetiyan, di rêvîngiyek kurt de ku nehatibû ragihandin ber bi cihê bûy-
erê ve çû û ew her li wir jî bilez bi cih hêla û nevêra heta kombûnek hev-
emiyê bi amadebûna hêzên ewlehî digel xelkê rêk bixe!

Eva ku rohn e û di berê de jî bo azadîxwazên Îranê bigiştî û qurbaniyên
deştê rejîma Axûndî bitaybetî hatiye îsbatkirin, ev raştiya haşalahilnegir e
ku ya di Îranê de û bo hikûmetê wate nebûye û wata nîne û wata jî nabe, can
û jiyana xelkê ye, ne çi tiştek din! Ew amade ne di pêxema paraştina deştih-
latê û jiyana xwe de netenê xelk, belkî canjiber û bêcanên wî welatî jî bikin
bi qurbanî!

Eva ew nisxeya Îslamê ye ku Xamineyî wek “nûnerê Xwedê li ser erdê”
li cihê biriyardan bo peydakirina xetakaran û sizadana wan û hewildan bo
qerebûkirina ziyanberketiyan, bo xelkê dipêçe. Lewma em dibêjin di Îranê
de **çi bêwate ye? Canê xelkê!**

Sergotar

Paşeroja bê derbasbûyî

N: Kerîm Perwîzî


Zêdetir ji her sal û mehekê pêştir, herifên li ber çavê rejîma Xumeyî û Xamineyî ye û Xamineyî yê cihgir li salvegera mirina celadê rûreş ê dîrokê de, li cihê gefên hertimî ên xwe, behsa bi kirêgirtiyên xelkê Îranê û herwisa tîrsa xwe û hevkarên xwe ji herifîna rejîma xwe kir. Xamineyî bi awayê lal û pirtê pirtê got ku rejîma wî tê herifandin û wekî çawa li Feransayê piştî şoreşa rejîma berê hate serkar, dúbare li Îranê jî ew nigeraniye heye!

Ji wê demê ve ku di Pûşpera 78ê de, Xamineyî di hem-ber xebata xwendekaran de kevîbû recifandinê û giriya û got, ger wêneyên wî jî bidirînin çî ji wan re nebêjin, eva jî carek din e ku Xamineyî li hember xwenîşandana xelkê kevîtiye recifandinê. Lê wê carê belkî derfet nebe rejîma xwe rizgar bike, çimkî durûyên wek çak-saziya wê demê nînin da ku hevkarîya wî bikin ku nizama wî bê paraştin!

Di nav keşa siyasî ya di-jberên rejîma Tehranê de, behsek zaf tê kirin ku çî bê kirin da ku xwenîşandan xelkê bê rêxistinkirin û xebata seranserî û hevahengî bi rê ve here. Cardin pirsîyara kevn serî hildaye ku çawa û kê dibe alternatîvek bo rejîma Komara Îslamî?

Rohn û eşkere ye ku gotarek dikare bibe alternatîv ku pîrîniya civatgehê li xwe bigire û di rewşa niha de civatgeha çendrengî û zêdenetewî di nav cugrafîyaya Îranê de hewcehî bi pilatformekê heye ku hem qatên cuda û daxwazên wan bibîne û hem zêdenetewiya civatgehê û hem derbasbûn ji rewşa desthilata olî û îdolojîkî.

“Mîstefa Hicrî” di peyameke vîdyoyî de piştevaniya PDKÎ ji xelkê El-ehwazê re daye zanîn



Roja Çarşemî 11ê Coz-Rerdana 1401an a Rojî, Lêpirsiyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê di peyamek vîdyoyî de rû li xelkê El-ehwazê daye zanîn ku “Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ji daxwazên we yê mafxwazane piştgirî û piştevaniyê dike.”

Deqa peyamê wiha ye:

Xelkê xebatkar û azadîxwaz ên Ehwez, Abadan û bajarên din ên wê navçeyê

Îradeya yekîtiya we ya li wê nerizayeti û serhildana we ya wê mîdehê li dijî serkurtariyên rejîma terorîst a Komara Îslamî ya Îranê, nîşaneyê ve

ye ku hevwelatîyên Erebb ên welatê me di wê navçeyê de bi hişyarî û azadîxwazî ve daxwaza mafê xwe dikin.

Xelkên ku her ji detpêka hatina serkar a wê rejîmê ve, di bin zilma du qatî û tepeseriya eşker de bûn û bi şeweyên cuda ji aliyê wê rejîmê ve hatine serkurtkirin.

Ew siyaseta û bernameyên rejîmê li derheq tev azadîxwazên Îranê, nemaze netewên bindest, bi berdewamî dom hebûye. Netewa Kurd li Kurdistanê bi rohnî digel wê siyaseta nasiyar e û bi kevl û heştîyên xwe ve, ew zilme ceribandîye.

Her di vê derheqê de, em ji dil ve digel we hevxebe û hevaheng in û piştevanî li daxawzên we yê rewa û xweragiriya we dikin. Gelek baş e ku di bin siya xebata yekparçeyî û yekrêzî de, tev azadîxwaz û nemaze netewên hatinî serkurtkirin û perawêzxiştin, desthilata wê rejîmê bipêçin. Emê serbikevin.

Ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ve, em sersaxiyê dibêjine tev malabatên qurbaniya avahiya “Mêropol” û xebatkarên netirs ên “El-ehwaz”ê û bajarên din ên wê navçeyê û em xwe şerîkê xema wan dizanin.

Lê hin deng di wê navberê de tene belavkirin ku di rewşa niha de ku xelk di jawriyan dibînin û xwenîşandana cemawerî bi rê ve ye, bila em zêde li ser wan tiştan hûr nebin û zêde rûpelên berê hil nedin. Tenê çavê me ji paşerojê be!

Ew silogana ku paşerojê tîne ber çavê me, hindekê dicirûske û ciwan tê berçavê me, lê ger tenê çavê me ji paşerojê be, ev pirsîyare tê afirandin ku kîjan paşeroj? Paşeroj çawa ye? Gelo tenê bi vê ku di paşerojê de êdî Xamineyî nîne, bes e bo vê ku bîr ji çî nekin? Ji van hemûyan girîngtir, ev pirsîyare ku me wekî tev civatgeha Îranê li kuderê şaşitî kiriye ku em wiha gihane bi vir? Ew derbasbûya ku me hebû çawa û bi çî şeweyekê me avedan kir, wiha Xumeynî û Xamineyî bûn bi celadê xwînmij bi ser me de û niha jî digel be, em bi destê êşa hebûna wa dirindane dinalin?

Renge li cîhana helbestvanî û yan dewreyên taybetî bi psîkolojîk bo çêkirina nexweşiyên derûnî, behskirin li ser siloganeke wiha ku tenê çavê me ji paşerojê be, ciwan be. Lê di jiyana netewan û civatgeha zêdeneteweyiya Îranê de ku li dijî herifîna Şah şoreş kirin, lê tenê çavê wan ji herifîna Şah bû, wan nedizanî ku çima Xumeynî hatiye ser kar, ew silogane gelek bi awayê xelitandî ye û metirsiya qirkirinek din li pey tê.

Her kes û her neteweyek û her civatgehek zêdenetewî wekî Îran, ger tenê çavê wê ji paşerojê be, bi alxahîni ve derbasbûyîya xwe ji paşerojê de dúbare dike!

Dîktatortir ji bavê xwe



N: Nûredîn Sofîzade

Raşt li devedevê serhildana xelkê Îranê bi dijî dîktatoriya rejîma Îslamî û hevdem digel berfirehtirbûna roj bi rojê ya xwenîşandanan û li demekê de ku egera hindê heye ji nişkê ve şoreş û serhildaneke seranserî di Îranê de çêbibe û tex û bextê axûndên deshilatdar tev bipêçe û bihavêje nava kulfengê dîrokê, Riza yê kurê Mihemedriza Şahê gor bi gor, cehdê dike xwe wekî rêber û alternatîvê piştî Komara Îslamî bide xuya, û peyaman dide û wisa diaxive ku goya rêber û diyarîkerê hêla xebata xelkê belengaz ên Îranê ye.

Lewma hewce ye ku her di niha de ev kurê dîktatorê berê berteka xwe wergire û dibe hem ji aliyê xelkê rojreş ên Îranê ve û hem ji aliyê hêz û aliyên siyasî yên xebatkar û demokrat û bi taybet tevgêra netewên bêmaf ên Îranê ve bersiva xwe wergire.

Hemî kes dizane ku di sala 1979an de, gelên bindest ên Îranê wekî Kurd, Belûç, Erebi, Tirkemen û Azerî bi hegera xwinmijî û dîktatorbûna rejîma Paşayetî serî hildan û şoreş kirin û karîna rejîma Şah sernixûn bikin, da ku hivî bi wê hindê hebûn belkî bi nemana wê rejîma zalim, bikarin bigîjne maf û azadiyên xwe û xelkê Îranê jî hewayekî azad a siyasî hilmije û her bixwe bikarin li birêvebirina welatê xwe de rol bilîzin.

Gelên bê maf ên ku pêkhênerên welatê Îranê ne, bi wê hivyê wisa dizanin ku renge piştî nemana dîktatoriya Paşayetî ev jî bibine xwediyê mafê wekhev ên welatîbûnê û kultûra dîktatorane ya yek ziman, Yek



şand, yek ala, yek welat, yek millet nemîne û Îran bibe ya hemî cudahiyan.

Xelkê Îranê li ber hindê rejîma dîktatora Şah sernixûn kirin ku êdî tenê kesek bedela hemî xelkê Îranê biryarê nede, tenê malbatek hakimê hemî Îranê nebe, serwet û heyîya welat tenê li qorixa wê malbata sitemkar de nebe, dezgeha ewlehiya bi navê “SAVAK” ê xwîna xelkê nemije.

Li serdema bavê wî de, hemî azadiyek siyasî qedexe bû, baskirin ji pirsê mafê netewan qedexe û hikmê sêdarê li pey bû, baskirin ji hilbijartina azad qedexe bû, bersiva rexnegirtin ji deshilata Şah, mirin bû, Şah jî hemî xelkê Îranê bi ewd û xulam û xizmetkar û bindestê xwe dizanîn û wisa dizanî ku dibe xelk spasguzarê wî bin ku sîbera Şah bi ser wan de ye.

Rejîma Şah gelek xwinmijtir ji ya Îslamiya piştî xwe bû, hekî îro rojê Weliye Feqîh xwe nûnerê Xwedê bi ser xelkê de dizane û jêve ye gotina wî xelk dibe wekî gotina Xwedê qebûl bike û her kesê berevajî bifikre, ewa kafir û “murted û fasîde” û bi sûçê şer li dijî Xwedê dibe bi mirinê bê cezadanê. Şahê gor bi gor jî li ser heman bingeha kite dîktatoriya xwe bi ser



xelkê de sepandibû, wî jî tenê pileyekê xwe Xwedê kêmtir dizanî, wî jî digot Xwedê – Şah – Welat.

Hekî çi mixabin hemî deskevtên şoreşa bi dijî dîktatoriya paşayetî ji aliyê komek melayan û bi rêberiya Xumeynî ve deşt bi ser de hate girtin, û xelk bi hegera nebûna ezmûna şoreşê û bi hegera leyîştina melayan bi heştê olî ve hatine xapandin, û negihîştine wan armanc û xweziyên ku şoreş jê re kirin, lê bê guman her li yekem rojên piştî hatina ser kar a rejîma Îslamî ve, naveroka dîktatoraneya rejîma Îslamî jî bo wan xuya bûye û ji hingê ve berdewam cehdê dikin wê dîktatoriyê jî sernixûn bikin. Îcar em bêjine Riza yê kurê Şahê dîktator ku bila baş tê bigîje, kanê xelkê Îranê çi dixwaze.

Xelk û bi taybetî netewên bê maf ên Îranê piştî ceribandina 2 hikûmetên dîktatorî yên Paşayetî û Komara Îslamî, gelek ji mêj ve ye ku cehdê dikin û dixebitin ku carekî din şasiyê nekin û hikûmeta rêberê kite kesî û merce'iyeta olî û Paşayetî û malbatî ku hemî deshilatan bêxe ber deştê xwe, ducarî nekin, belkî gelên Îranê hinde hişyar û tîgihîştine ku dizanin êdî nabe bihêlin hemî deshilat di navendê de kom bibe.

Xelkê Îranê bi giştî û gelên bê maf bitaybetî daxwazkarê hikûmetek azad û demokratîk in ku bikarin tê de bigîjine hemî mafên netewî, olî, çandî, siyasî, sinfî, qatî û cinsiyetî, ew mafane jî di demekê de dikarin bi deşt ve werin ku hikûmetekî demokratîk û sistemekî federal bête ser kar. Kurê Şah ku ewa 44 sal e bi bê vê ku nasiyariyek li ser xebat û hizir û çand û hişyariya xelkê Îranê hebe û wî heyamî de serê wî li dîsko û qumarxane û “eyş û nûş”ê de bûye, bi wê xeyalê di demekî wiha de tê peyamê dide ku wisa dizane hakim e û dibe tenê xelkê Îranê di navbera wan 2 dîktatorîyan de yekê hilbijêre.

Gedê Şah hinde dîr ji heşt û hizira xelkê ye û 44 sal e nizane ku di Îranê de çi derbas dibe, niha jî weke bavê xwe yê dîktator amade nîne îtirafê bi hebûna netewên wekî Kurd, Erebi, Tirkemen, Belûç û Azerî bike. Niha jî wan netewane bi tayfe û eşîret pênase dike, niha ku wekî kite kesekê dîr ji welat ve amade nîne basê maf û azadiyan û basê demokrasiyê û wek heviyê bike, îcar hekî ew kesê han rojekê bikare bigihîje ser deshilatê, çi şik û gumanek çînîne dê hem ji bavê xwe dîktatortir be û hem dê rûyê reş ê dîktatoriya Îslamî jî sipî bike.


Ger zimanê Kurdî li Rojhilatê nebe zimanê perwerdeyê!



N: Azad Kurdî

Mamoştaya zimanê kurdî Zara Mihemedî ku niha di girtîgeha rêjîma Îranê bi tawana fêrkirina zarokên kurd bi zimanê kurdî 5 sal cezayê zîndanê dikişîne, di dawî hevpeyvîna xwe de berî ku biçe girtîgehê, got : « Armanca sereke û girîng a Encûmena Nûjîn ne fêrkirin bi ziamnê kurdî ye ; belkî daxwaza me ew e zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û zarok divê di naven-dên xwendinê de bi awayekî sistematîk fêrî zimanê kurdî bibin... »

Xetera jinavçûn û lawazbûna zimanê kurdî micid e



Ev gotina mamošta Zara di warê zaniştî de duruşt û girîng e. Ji ber ku dema zarok bi zimanê xwe yê dayîkê perwerde nebin, êdî bi wî zimanî jiyanê dikin ku pê re perwerde dibin. Lewma em dibînin piştî 40 salan ji desthilatdariya rêjîma Îslamî ya Îranê û qedexekirina zimanê kurdî ji perwerdehiyê di xwendingehan de, êdî nîfşa nû xwendin, nivîsîn û heta fikirîna wan jî bi farsî ye. Ji

ber ku tenê malbat têr nake ku zarok fêrî zimanê dayîkê bibin. Niha li civaka Rojhilata Kurdistanê em dibînin ku zarok herçiqas kurdiyêke lawaz jî fêr dibin di nav malbatê de, lê dema diçin xwendingehan û bi neçarî zimanê Farsî dielimin, êdî xwe bi xwe ev ziman dibe , zimanê peywendî, kar û jiyanê wan û ev yek metirsî û gefê dixê ser zimanê Kurdî. Niha metirsî û xeter micid e û her

diçe zêdetir û berçavtir dibe.

Qedexekirina zimanê kurdî li Îranê ji aliyê rêjîma Îranê, bi vî armancê ye ku, zarokên kurd bi perwerdebûna bi zimanê Farsî, di nava ziman û çanda neteweya serdest a fars de asîmîle bibin. Bi farsî bixwînin, binivîsin, bifikirin û bijîn. Ev yek metirsiyeke mecid e ku piştî 40 salan niha zêdetir ji her demê xwe derxistîye holê. Vê yekê hewcehiyê bi bizaveke bilez û micid heye li Rojhilata Kurdistanê hem ji aliyê rêxistinên siyasî li derve û hem jî rêxistinên civakî li navxweyê welat ku bikarin li hember vî siyaseta bişafîtin, asîmîlekirin û helandina dewleta Îranê tedbîran bigire pêş û bi xebat û çalakiyên cuda civakê ji van metirsiyane agahdar bikin.

Ger ev bizav neyên destpêkirin, dê 5 salên din gelek direng be.

Spaha Quds a terortîst di hewla terorkirina endamên rêberatiya PDKÎ de ye

Pêka raporên belavbûyî li ragihandinan, pîlana terorkirina endamên rêberatiya PDKÎ ji aliyê yekeya 840 a taya Spaha Quds a Spaha Pasdaran, hatiye eşkerekirin.

Pêka raporên belavbûyî, yekeya 840 a Spaha Quds a terortîst, bi hevkarîya çend xwefiroşên xelkê bajarê Urmîyê yê bi navên “Mensûr Resûlî û Luqman Resûlî”, di hewla birêvebirina pîlana terorkirina Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ “Mîstefa Hicrî” û berpirsê Dezgeha Çavedêriya PDKÎ “Roştem Cehangîrî” de bûne.

Meha Banemra îsal, ragihandinên Îsrailê behsa vî yekê kirin ku, li nav axa Îranê lêpirsîn ji kirêgirtiyê Spaha Pasdaran yê bi navê “Mensûr Resûlî” ê xelkê gundê “Hêşmava” yê girêdayî devera Mirgewer a ser bi bajarê Urmîyê kirine, û navbirî îtiraf bi hebûna bryara encam dana çendîn



pîlanên terore li welatên derve de kiriye.

Çavkaniyên nûçegihaniya “Kurdistanmedia”yê ragihandibûn ku, lêpirsîn ji “Mensûr Resûlî” 4 mehan berî medyayîkirina wê mijarê hatiye encamdan û niha navbirî di xaniyek ewleh de li jêr çavedêriya Îtîla`ata rejîmê de ye.

Yekeya 840 a taya Spaha Quds a Spaha Pasdaran bi awayê veşartî hatiye avakirin, erkê wê taya Spaha Pasdaran, dariştina pîlanan bo birêvebirina kiryarên terortîst li derveyî Îranê li dijî partiyên opozîsiyona rêjîma Îranê û berjewendiyên welatên Rojavayî ye.

Beşek ji pîlanên vî yekeya terortîstî, li 3 beşên “Rojhilata Navîn û Afrîqa”, “Qefqaz û Asiya” û herwisa “Ewropa û Amerîka”yê hatine parvekirin û di salên derbasbûyî de gelek ji kiryarên terortîstî yê vî yekeyê eşkere bûne û hatine pûçkirin.

Dorpêçên Rojavayê yên li dijî rejîma Îranê

N: Namo

W: Agirî Enzel

Dorpêçên lidijî Îranê komek ji hewlên hêzên cîhaniyan re tê gotin ku, mebesta wan ji “cevadana hikûmeta Îranê an neçarkirina wî welatî bona cîbicî kirin an cîbicî nekirina kiryareykê” ye. Eva pênas-eyeke zelal û hêsane ji wat-eya dorpêçan re.

Dorpêç di sîstema cîhanî de weke, amûrekê ye bona rikberîkirina stratîjîk di navbera welatên dijberê û yek mifah jê tê wergrtin. Helbet piştî herifîna Soviyeta berê û yekalîbûna cîhanê birêberatiya Amerîkayê û welatên rîbiral yên digel Amerîkayê, heta niha aştêk dorpêçan xwe nîşan dane, helbet ne li tev welatên dijberê yek de.

Lê, atmosfera siyaseta navneteweyî a niha ne yek-polî ye û cîhan bi awayek aram ber bi enya pêkhatiya çend aliyên bihêz yên aborî bo pêşve dimeş e. Ev yeka dikare bibe sedema kêmkirina bandorên dorpêçên Amerîka û hevalên wî yên ku lidijî hin welatan dorpêçên aborî îlan kirine.

Dorpêçên lidijî Îranê yên piştî şoreşa sala 1357'an û herwisa piştî dagîrkirina balyozixaneya Amerîkayê ya li bajarê Tehranê deşt pê kir û piştî deştê kirina bernamêyên navkî yên Îranê rijtir bûn e. Piştî li devra serkomariya Trump û di rêza pilaneka bi navê “givaşên bêsînor”, dorpêç gihîştine aştê herî bilind a kupika xwe. Dorpêçên li dijî Îranê li 4 deştêyan de tînin parvekirin ku bi wî awayî ne:

1- Dorpêçên çend alî, weke, dorpêçên Şêwra Ewlehiya Saziya NY

2- Dorpêçên Yekîtiya Ewropayê

3- Dorpêçên yek alî yên

welatên cuda yên weke Amerîka

4- Dorpêçên Kongreya Amerîkayê

Di meha Xakelêweya sala 1400'an de, Mike Pompeo wezîrê berê yê karûbarên derve yê Amerîkayê ragihandibû ku, li dema derkev-tina Amerîkayê ji bernamêya Lihevkirina Bercamê, û di encama rikeberiyên givaşên bê sînor, zêdetir ji sedî 96 ji paşkevtên aboriya Îranê jînav çûne.

Sandiqa navdewletî di raporeke xwe de ragihandibû ku, paşkevtên aboriya Îranê yên ku deştê wê bigihîjinê, ji 5.122 milyar Dolarî li sala 2018'an de, gihîştîye 4 milyar Dolarî li sala 2020'an de.

Bêguman dorpêçên Amerîka û Rojavayê yên lidijî rejîma Îranê yên piştî şandina dosyeya navkî bo Şêwra Ewlehiyê di sala 1385'an de, bû bi aştêgek bona kirîzên aborî û civakî yên Îranê yên niha. Lê, yaku navkîbûna Îranê pêş ji civakê de erê nake, bi sedema helsokevî û dîtingeha rejîma Îranê ye, rejîma êdolojîk û girtî ku siyaseta derve ya vê her li ser bingeha cîhana Îslamê û mesebê Şî'e hatiye avakirin û niha ev siyaseta dijmînkaranê ye û bi stratîjiya êrîşkirina pêşîgrtinê jînav dibe.

Îran welateke dewlemende û serkaniyên mezin yên petrol û gazê hene lê, xelkê Îranê kêmtirîn qazancê ji wan samanan wêdigrin û tev dikevtin di bin qorkariya Spaha Pasdaran de. Bi wî awayî ku navê Spaha Pasdaran li şoreşa Îslamî de xuyaye, peyva Îranê jê hatiye qutkirin û ev yek nîşana dîtingeha transnetewe ya Spaha Pasdaran e. Spaha Pasdaran saziyeke terorîstî û neyasayî li Îranê de ye. Hêzên cîhanî û saziyên navneteweyî bona rûbirû bûna li hemberî Spaha Pasdaran ji dorpêçan wek kom hewlên pêşîgrtinê mifahê jê wêdigrin. Li hember



de wisa xuya ye ku Îran jî rêyên devr lêdana dorpêçan gelek baş nas dike. Yek ji rêyên parastina dorpêçên Rojavayê, berhemanîn û mifahwergritin ji remza pereya ne. Mezintirîn başiya remzên pereyan eve ku girêdayî ti welatekî nîne, tev dikarin vê derbixînin û di mi'amileyên cuda de bi hêsani bo kesek din bişînin, herwisa ne dorpêç dikarin pêş bi mi'amilekirina bi remzên pereyan bigrin û ne jî saziyên aborî yên navneteweyî. Dîtingeha dewleta Joe Biden li derheq dorpêç û dosyeya navkî ya Îranê de.

Wisa xuya ye ku armanca stratîjîk a dewleta Biden ya li derheq Îranê de pira navkî dibe. Herçend ku wisa ragihandiye ku, zivîna bo nav bernamêya Lihevkirina Bercamê, armanca sereke ya siyaseta derve yên Amerîkayê li hemberî Îranê de ye lê, ew zivîna bi wateya asayîbûna peywendiyên aborî yên derve yên digel Îranê nîne. Arîşeya siyasî a parlemanê, lobiyên bihêz yên dijberên rejîma Îranê li Amerîkayê de ye, û derbasiya peywendiyêke tijî alozî di navbera wan herdu welatan de ye, nîşan dana hêzê li herêmê û gefxwarina ji hevalên Amerîkayê, Îran weke welatek dijmîn pênase dike. Siyasetên givaşên bê sînor ku bûye sedema enflasyonê û sekinîna peywendiyên bankan, û niha jî

amûreke ku dewleta Biden jî mifahê jê wêdigre e. Lê, Îran bona rûbirûbûna li hemberî moxtarê cîhanê de, pena xwe bo xwendekarên Konfisûsa feylesofên welatê Çînê biriye û bi lihevkirina 25 salane deç dixwaze vizeya hewce a welatê Çînê bona geşekirina wî welatî dabîn bike.

Belgenamêya hevkarîya Îran û Çînê lihevkirineke siyasî, stratîjîk û aborî ye, tevî şêleyên ne zelal! lihevkirina rejîma Îran û Çînê wiha ye: “Sermayegozarî li pişeya petrola Îranê de, kompaniyayên neteweyî yên hinardina gaza Îranê, kompaniyayên neteweyî ên pişeya pêtrokîmayên Îranê, jêrxanên Îran û hevkarîyên leşkerî, ewlehî, çandî û dadwerî yên Çînê li Îranê de”.

Pêka rapora aborîzanên, rêjeya sermayegozariya di vê lihevkirinê de, berambere digel 28 heta 400 milyar Dolarê Amerîkayê. Rexnegir wê lihevkirinê bi dîplomasiya daw û deyin didin zanîn ku, ji Îranê re zirar he ye.

Lê, gefa sereke bo Amerîkayê ye, Komara Çînê ku roj lipey rojê bihêztir dibe û ji serçaveyên Îranê mifahê wêdigre. Di vê navberê de, deştîlatdarên xeyalî yên Îranê di wênêya giştî de tenê rikeberên stratîjîk ên cîhanî de pêlwarên wî agirî ne.

Çoman Kawe: “Di raştiyê de jiyan demekê wate dibe ku mirov bikare azad û serbest bijî”



Min hevpeyvînek li derheq bandor û çawaniya jiyanê pêşmergeyatiyê digel “Çoman Kawe” Pêşmerge Hêza Pêşmerge Kurdistanê Îranê pêk anî û wî li ser Ezmûnên jiyanê asayî di beşekê de wiha bersiv da: “Dema ku mirov jiyanê şoreşgerî hildibêjre hewla hînbûna darsa wêrebûn û cangorîkirinê dibe”.

Hevpeyvîn: Hesên Mukerem

P: Rêzdar ji kerema xwe, xwe ji me re bidin nasandin?

B: Navê min Çoman Kawe ye û xelkê gundê Nê yê girêdayî bajarê Merîwanê me.

P: Rêzdar çawa bû ku we beraxwe da nav refên Hizba Demokrat?

B: Ez wekî her xortekî Kurd ku bi dirêjahiya dîrokê de mafê neteweya min hatiye bînpêkirin û dujminê gelê Kurd nehêlane Kurd bixwe mafê çarenivîsa xwe dest nîşan bike. Min ev yek erka xwe zanî ku li hemerî zilm û zordariyê de helwestê hebe û erka neteweyatiya xwe bicîh bînim, her ji ber vê yekê û bona bicîh anîna erka nîştîmanî a neteweya xwe, çeperên xebatê û têkoşîna xwe di nav PDKÎ de hîlbijart û bi baweriya min Partiya Demokrat bihêztirîn û baştirîn meketebe ku mirov dikare bi baştirîn şêwaz xwe perwerde

bike. Herwisa bona standina mafê neteweyatiyê vê kesayetiya ku dide bi mirov ev kesayetiye ku hêjayî kesayetiya şoreşgr e. her ji ber vê sedemê ye heta dema ku neteweya min negihîje bi mafê rewşa xwe, ez çeperên xebatê di nav Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê de vala nakim.

P: Ezmûnên jiyanê asayî digel ezmûnên jiyanê şoreşgerî heta çi qasî li ser we bandor hebûye?

B: Di raştiyê de jiyan demekê wate dibe ku mirov bikare azad û serbest bijî û bikare li ser çawaniya jiyanê xwe biryar bide. Lê, ev jiyanê asayî ku berê min hebû bê guman tev ew azadiyên ku berê wek mirov û piştê weke neteweyî aliyê dagîrkeran ve hatine bînpêkirin, ev jiyanê nebû ku mirov bikare derbas bike. Mirovê ku azad jiyan neke eva kîrmeta wî/ê hatiye bînpêkirin. Cem min jiyanê şoreşgerî jiyanê serbîlîndane û şîrafetmendane ye, ya ku ji bo min girînge li hember vêjdana xwe û li hember neteweya xwe de rû geşim ev îhsaskirina bi azadî û şîyanê ye ku zêdetir xwe erkdar dizanim bo xaka welatê xwe ji ti cangorîkirinekê û berxwedaniyekê bê par nekim. Niha cem min jiyanê wate heye û ez wisa bizanim ev wateya li derheq jiyanê asayî di bin zordariya dujmin de hebe.

Dema ku mirov jiyanê şoreşgerî hildibêjre hewla hînbûna darsa wêrebûn û cangorîkirinê dibe û di jiyanê de dibe em hîn bibin ku çima xebatê dikin û çima dimîrin û cem me jiyanê çawa wate girtiye, her wekî çawa rêberê mezin yê me şêhîd Dr. Qasimlû yê nemir dibêje: Em hîn dibin baş bijî ku hîn bibin baş bijî û hîn jî dibin ku baş bimîrin. Her ji ber vê sedemê ye ku di jiyanê şoreşgerî de, digihîjin bi astek bilind a fêmkirinê û heta ku mirov negihîje bi wî astê

nikare jê fêmkirina bike.

P: Gelo di Kurdistanê de zêdetir çi tex û çînek ji civakê giraniya şoreşê li milê e?

B: Di raştiyê de dema ku welatê te hat dagîrkerin hemû çîn û texên civakê giraniya şoreşê li ser milê wan e, û dibe hemû çîn û texên civakê wî erkî bigrin bi stûyê xwe, lê ciwan ku hêza makî û çalakiya civakane giraniya şoreşê zêde li ser mile wan e û çi keç û çi jî kur dibe di ber bi pêş ve birine şoreşê heta serkevtinê xwe ji ti kar û têkoşînekê bê par nekin û weke stûnên civakê vê erka giran bigrin bi stûyê xwe heta ku neteweya me bigihîje bi mafê neteweyatiya xwe.

Jinên nîştîman ku di drêjahiya dîrokê de çi weke Kurd û çi jî weke jin ku mafê wan hatiye bînpêkirin. Dibe zêdetir ji caran kûrahiya xebatê û têkoşîna rakîn û bîna bo nav çeperên xebatê li dijî dagîrker bisekinin ku bi bexteweriyê ve îro dibînin şîpelek berfireh ji vê texa civakê hatine bo meydana xebatê û têkoşanê bona standina mafên xwe. Mamosteyên ayînî, zanîngeh û xwendîgeh ku zêdetirîn rewatiya wan di nav civakê de heye, dibe niha ev erka kevtîbe li ser milê wan û di hişyarkirina ciwanan û herwisa têgihandina xelkê bo xebatê û azadiyê hewl bidin.

P: Gelo eger li Îranê ti partiyek Kurd dest bo xebatê nebirba çarenivîsa civaka Kurdistanê çawai dibû?

B: Bêguman heta îro partiyên Kurd şîyanê rolek baş di Kurdistanê de bilîsin bona bideştveanîna mafên neteweyatiyê yê xwe, partiyên Kurd di hişyar kirina xelkê li derheq pîlanên dujminan û herwisa nîşandana rêya rast bo xebatê bo xelkê rohnkirinê ji xelkê re didin. Dujminê Kurd bi hemû şîyanê xwe xwaştine Kurd weke neteweyî navbibin. Haşakirinê ji hebûna Kurd bikin, û her-

wisa nasnameya gelê Kurd ji nav bibin. Dema ku wisa ye partiyên Kurd rolek baş di parastina nasnameya neteweyatiyê de hebûne û şîyanê ev pîlanên ku bona ji navbirina nasnameya neteweyatiyê darêjane pûç bikin û xelkê hişyar û agehdar bikin.

Kurd bi dirêjahiya dîrokê de di hewla xebatê bo azadî û serbestiyê de ti demî nesekinîne û alaya xebatê û berxwedanê her demî qît bûye û partiyên Kurd di hemû deverên hatinî parvekirin de, bona ber bi pêşvebirina xebatê nesekinîne û hizra xebatê û têkoşanê di nav rêberên Kurd de hertim biromet bûye û bûne mertalek bona parastina neteweyî. Eger partiyên Kurd di çeperên xebatê de nebana bêguman niha çarenivîsa gelê Kurd ber bi aliyê xerab ve diçû û renga niha wateya Kurd û Kurdbûnê di civaka kurdewarî de tunebû û eger jî heba dê di rewşek xerab û asîmîlasyonê de biba.

Bêguman hemû deman xwaştine welatê çi li warê zîman û çi jî li warê kultûrî ve asîmîle bikin û bîxînine bin deşhilata xwe de û ew bixwe hêlê bo xelkê deşt nîşan bikin lê, bi hebûna partiyên Kurd heta astek zêde di vê hewlê de serkevtî nebûne û yekek ji erkên girîng yê partiyên Kurd parastina zîman û kultûra kurdewarî bûye.

Diyare ku behsa neteweyê dikin neteweyî bi hebûna zîman û kultûra taybet bixwe wate digre û dujmin jî hemû hewla wî ewe ku wê nasnameya neteweyatiyê qut bike, lê ya ku girîng e rola partiyên Kurd e ku pêş ji wan pîlanên dujmin grtine. Di dawiyê ji rojnameya Agirî re spasê dibêjim bona vê derfetê.

Serbikeve xebeta rizgarîxwazî a gelê Kurd û bemire deşhilata zêdexwaz û berçavteng a dagîrker.

Nerîna Lîderan



“Mikhaïl Ulyanov”:

“Li vê diçe ku biryarnameya pişniyarî ya sê welatên Ewropayî ku Amerîka ji wê piştevanî dike, roja Çarşemî di Şewreya Hukam a Ajansa Navnetewî ya Wizeya Navkî de bê gengeşekirin”.



“Javier Nart”:

“Min ji diplomatên Tirkîyê re gotiye, rêkevtina aştiyê li Tirkîyê bê Kurdan nabe û nikarin Kurdan bikin bi Tirk”.



“Inger Andersen”:

“Divê Îran çalakvanên jîngehî yên li girtîgehên Îranê de azad bike”.



“Elî Xamineyî”:

“Me bi zewtkirina 2 neftkêşên Yûnanê, nefta xwe ya jîdestdayî qerebû kir”.

Çepgir, dujminên sereke yên nijadperestên Almanî ne!



N: Eskender Ceiferî

Di salên derbasbûyî de dehan êrîşên tundrewane û nijadperestî li Almanya çê bûn.

Piraniya wan jî çepgir, weke dujminên xwe binav dikirin. Êrîşa herî mezin, li parêzgeha Sachsen-Anhalt bû.

Di 9-ê Çiriya 2019`an de, terorîstekî êrîşkar ê raştgir li Sachsen-Anhalt Almanê gulle berdan li ser du kesên bi navên Jana L. û Kevin S. û di encamê de wan jiyana xwe ji deşt da. Bi giştî, wî hewl da ku 69 kesên din jî bi-kuje. Armanca wî ya yekem kenîseya civata Cihûyan a li Wasserturm li bajarê Halle Saale bû. 52 kesên ku bikuj dixwest li wê kinîştê bikuje, li wir karên xwe yên olî dikirin. Roja 9`ê Çiriya 2019`an ji hêla Cihûyan ve wekî Yom Kippur dihat naskirin; Cejna herî bilind a salê ya Cihûyan e ku li kinîştê tê pîrozkirin. Bikuj agir berda derî lê nekari xwe bigihîne kinîştê. Hev-dem wî têrorîstî, Jana. L. di kolanê de di demekê de kuşt ku wê dixwest bi wî terorîstî re biaxe.

Sûcdar dev ji êrîşa li ser kenîseyê berda û berê xwe da Ludwig-Witcher-Straße. Di vîdyoyeke zindî de, wî diyar kir ku dixwest mirovên ku ew difikire koçber in, bikuje. Wî li xwaringeha Kiez jî zilamek bi navê Kevîn. S. ku xwarin jê re dihat amadekirin, kuşt.

Niha çalakvanên Almanî dibêjin tevî ku ew hatiye sizakirin jî, lê nabe bi ti awayekî dosye bê girtin. Ew di 21`ê Çileyê Pêşîn a 2020`an de bi girtîgeha hertimî hate sizakirin; bi vî rengî divê ew heya hertim binçavkirî be.



Çalakvan didin xuyakirin ji bo parastina civakê, divê tim kar li ser vê dosyeyê bê kirin da ku, nijadperestî berfireh nebe.

Kujer, nerînen raştgirane û tundrew hebûn. Wî nêrînek raştgir a cihanî hebû ku di qada civakê de ji ravekirinên derewîn pêk tê. Ew raman, weke faktorên afirandina kirîzê û metirsîdar tene hesabandin. Naskirina van ramanên bîrdozî yên raştgir ji bo dijatiya wan girîng e! Ji bo çalakiya li dijî bînpêkariyên mafên mirovan û berfirehbûna wan a civakî divê hevgirtîbûn hebe.

Çalakvan hertim tekezê dikin ku civaka Alman bi newekhevî, pêşbaziyek ne tendurîst û valahiya nav civakê re rû bi rû ye. Ev ji ber pergala aborî ya kapîtalîst û pergala siyasî ya tîkildarî ve mijarê ye. Di demokrasîya parlamentoyê de, hêza biryara siyasî bi piranî bîyî bandora raştîrîst a giştî ya civakê tê rêkûpêkkirin. Encam, newekheviya aborî û civakî ye; Ji ber ku li ser karûbarên aborî û civakî kontrola demokratîk tune ye.

Di nerînen cihanî yên raştgirî yên terorîstê bajarê Halle Saale de, dijberiya Cihûyan, nijadperestî û dijatiya tevgerên jinan mijara sereke ye. Ramana tundrê ya raştgir hin beşên civakê mîna Cihû û koçberan, weke berpirsyarên nebûna ewlehiyê û mercên dijwar ên jiyane binav dike. Li gor vê ramana raştgirî, bi cudakariya nijadî û dîrxistina nijadên din, rasgir dikarin ji bo xwe, dabînkirina çavkaniyên civakî, dahat,

xanî û mercên jiyane yên baş misoger bikin. Li gor îdeolojiya nijadperestiyê, ew li vir di rewşeke nebaş de derbas dikin, raştî tepisandin û mercên jiyane yên dijwar tînin.

Ew, dijatiya Cihûyan, newekhevî, û pêşbaziyek ne tendurîst wekî encama bernameyên veşartî yên civakê veşartî dibînin. Li şûna ku pergala civakî ji gilî û gazincên heyî re tawanbar bikin, ew fikirin ku ji ber kiryarên hin kesan raştî ve rewşê hatine. Ev demek dirêj e ku fikra ku Cihû hêza xwe ya veşartî bikar tînin, heye. Bîrdozîya dijberê Cihûyan bû sedema kuştina bi milyonan Cihûyan ji hêla Sosyalîzma Netewî ya Alman ve, ya ku di dema Hîtlêr de di bin biryara wî de pêk hat û hîn jî berfireh e.

Di heman demê de dijberên Cihûyan ramaneke raştgirane hene ku li gor nerîna wan, Cihûyan femînîzm û sosyalîzm dahênane. Ew, van ramanan bikar tînin da ku hêza xwe deştîşan bikin û nîrxên kevneşopî di civakê de tune bikin. Femînîzm wekî tevgerê azadiyê nayê deştîşankirin, lê ji hêla raştgiran ve wekî sedemek ji bo tîkdana hevgirtina civakê tê dîtin. Dijberên femînîzmê dixwazin dewletekê bîdomînî an vegerînin ku zîlam tê de serdest in. Ew di dawîya daxuyaniya xwe de herwisa dibêjin: Em di vê baweriyê de ne ku divê darizandina êrîşa raştgirî ya 9-ê Çiriya bi bidawîbûna darizandinê re bi dawî nebe. Ew gotûbêjek civakî ya bi bîrdozîya kujer û mercên civakî ye ku vê gengaz dike.

Çawaniya bersivdana gefên Tirkîyê



N: Ebdûlazîz Qasim

Bi awayekî rojane, ji aliyê deweta Tirkîyê ya dagîrker û çeteyên wê ve yên bi navê “koalîsyona Sûrî”, tawanên şer û dijemirov li dijî gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê tene pêkanîn, zêdebarî gefên rojane yên berpirsên Tirkîyê bi dagîrkirina tevaya Rojavayê Kurdistanê hevdem ligel tawanên qirkirinê û guhertina demografîk yên berdewam li dijî hebûna gelê kurd li herêmên dagîrkirî “Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê”, wekî nemûne ku hijmara şîniyên serêkaniyê pêş dagîrkirinê 80 hezar kes bûn ji wan bêtir 50 hezar kurd bûn, lê niha bi tenê 50 kesên kurd li Serêkaniyê dijîn!

Her di heman çarçoveyê de, di roja çarşemê 01.06.2022an de, serokomarê Tirkîyê Erdogan dîsa gefên pêkanîna êrîşeke leşkerî li ser du herêmên Bakurê Sûriyê dubare kir, bi taybetî li ser herdu navçeyên Tilrife’et û Minbucê yên Rojavayê Kurdistanê, hevdem ku di heman rojê de, Wezîrê derve yê Amerîka Anthony Blinken di prêskonfêransekî hevpar de bi Jens Stoltenberg re, Sekreterê Giştî yê NATO, hişyarî da Tirkîyê li ser pêkanîna êrîşeke leşkerî li Sûriyê û got, ew dê herêmê bixe di bin metirsiyê de, ji aliyê din ve ku ji aliyê Rûsyayê heta niha ti helwest li hember gefên Erdogan nehatine ragihandin û tê çaverêkirin ku Wezîrê derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov di 8’ê vê mehê de ligel şandeke leşkerî serdana Tirkîyê bike, ku helbet dê mijara êrîşa leşkerî ya Tirkîyê li ser herdu navçeyên kurdan bête gotûbêjkin.

Rojnamevan û şirovekara siyasî ya Sûrî ya navdar



“Semîra Elmesalma” di bin navê gotarekî de “Kurd di navbera berjewendiyên Biden, Pûtîn û Erdogan de”, balkişandiye ku Erdogan her derfetekî bikar tîne ji bo berfirehkirina rûberê dagîrkariya xwe li ser Sûriyê û got ku di nava rewşeke navneteweyî ya pir alozî û şer û qeyranên aborî de, bi taybetî hevdem digel êrîşa Rûsiya li ser Ukrayna, ku Erdogan vê yekê wekî derfet dibîne ji bo pêkanîna çiwaremîn deştwerdana xwe ya leşkerî di nav xaka Sûriyê de, di dema ku Amerîka niha bêtir mijûlî şerê Rûsiya li ser Ukraynayê ye, li gel zêdebûna tirsê Îsraîl û dewletên Erebbarê zêdebûna pêgeha hêzên Îranê di nav qada Sûriyê de, û pêwîstiya welatên NATO bi razîbûna Tirkîyê ji bo pesindkirina endametiya Swêd û Fînlenda di nav hevpeymaniya NATO de.

Semîra Elmesalma di beşek din ya gotara xwe de, bal kişandiye li ser dubarekirina têkiliyan di navbera dewletên Erebbî û Îsraîlê de û daye zanîn ku kiryarên guhertina demografîk yên Tirkîyê diguncê ligel berjewendiyên dewletên Ewropî, lewra dibîne ku nabe Kurd hêviyên xwe li ser helwestên navneteweyî ava bikin, nemaze ku Erdogan berê niha karîbû gavên xwe di hundirê Sûriyê de, bi hêsanî bideşt bîne, ji ber vê yekê ku mirov dikare bêje ku xwe spartina helwestên navneteweyî dê bimîne wekî kaxezek li ber bayê berjewendiyên navneteweyî ye.

Min di gotar û nivîsên xwe yên berê de jî dabû zanîn ku divê tevgera kurdî bi awayekî lez li ser çarenivîsa miletê xwe raweste û kar ji bo pêkanîna yekrêziya xwe bike wekî xala herî serekî û stratejîk ji ber ku gelê me di qonaxê herî heştyar û dîrokî de derbas dibe û nabe bi çavekî sivik li hêza dawelên dagîrker temaşe bikin, bi taybetî ku nabe sivikatiyê bi hêza Tirkîyê bike, ji aliyê din ku îro divê em li siyaseta xwe vegerin ji bo bihêzkirina îradeya gelê xwe li hember dagîrkeran, ku tenê bi yekrêziya xwe em dikarin miletê xwe biparêzin û rê li hember êrîşên dagîrkariya Tirkîyê bigirin, û bi taybetî ji PYD tê xwestin wekî partiyek deştihildar, ku deştberde ji totalîtera xwe û ji siyasatên xwe ya çewet û xirab, ku divê bersiva gefên Erdogan bi pêkanîna gavên yekrêziya kurdî bîne dan, bi yekdengî neji bi slogan û bilindkirina wêneyan, her dîsa bi dîtîba min ku divê ENKSê jî derkeve ji bazînê hevpeymaniya xwe ya bêwate ligel koalîsyona sûrî ya hevparê dagîrkirî û nijadperêsiya dewleta Tirkîyê ya dagîrker.



Jin goriyê bêparbûnê ye

N:Nîştiman Urmiye

W:Hesen Mukerem

Bêparkirina jinê ji wekheviyê dîrokek 5 hezar salî heye, li serdemên ku yekem şoreşa mirov hate gorê, şoreşa jinê rolek xuya di bûyerên wê de hebûye lê, bi pêşkevîna alav û teknolojiyaya modern a serdemê dema navbirî gav bi gav, rola jinê di civaka mirovahiyê de kêmîr kiriye û , heta îro ku mirov gihîştîye kupika çiyayê pêşkevîna û modern ê, di rêya gurherînkariya mirovahiyê de çendîn şoreş li paş xwe bicîh hêlîne, ti yek ji wan nebûye sebebkarê şikestina xeleta bêparbûna jinê, ji ber ku ti yek ji wan xwediyê reha bêparkirina jinan nebûye û her şoreşek di her serdemekê de bi şewazên xwe yê biarte jin îstîsmar kiriye û pêka demê bûye koleyek modern.

Em dikarin bibêjim ku siyaseta îzolekirin û bêparkirina jinê bi amadebûna bandordar di civak û her sistemeke siyasî de, her yek îdeolojiyek cud ye, herçend ku reha vê di cîhana yekem heta cîhana sêyem û ... hwd de, xwediyê wekheviyê ye. Û cudahiyeke ewqas di pîrensîpa binge-hîn a vê de tune ye. Lewre, welatê Îran û bitaybetî civaka Kurdewarî xwediyê meyl û zagonên xwe ên hişîk in.

Cihê ku virda ev pîrensîp xwediyê deşthilata îlahî ne, di cîhana sêyem de ji vê vedetir cih girtiye, cîhana ku li hûndr de jinê ti vebijêrek li ser laşê xwe tune ye, heta weke wê nîv nerîneke bibandordar li heramberî civakê de hebe. Bêguman şewaza bêparbûnê di vê civakê de xwediyê cudahiyan binge-hîn digel civakên din heta welatên cînar e. Bi gotinek din bêparkirin parçe bûye bi kategoriyên hûr, eger jin vedetir ji vê xirolkê pêngavan havêje raştî bêparbûnê tûnd û hin caran tûndtîjî û heta mirinê dibin.

Em dikarin bêjin ku: Ban-



dora jîngeh û cografîyayê, bandora hîzrên kevin ên weke (meseb, edet, rêûresm û ... hwd), hebûna bandora cografîya derdorê di pêngavên navendî de rola mertalê dilîse, (ji ber ewlehiya zêdetir). Di ziravtir kirina xirolka bêparbûnê de bandorên neyîn ên stratîjîk hene, wiha tiştên ku weke mafên deştîpêkî ên jinê tîr hesabkirin weke şoreşeke pîrr meza-xte xwediyê giraniyeke zêde ye, û derkevîna di bin vê bixwe de, serkevîna şoreşa wî bixwe ye, ji bo mînak di serdemên ne gelek dûr di vê cografîyayê de, bo jinê ajotvanîkirin karek ewqas hêsan nebû. Tev tayên bendavan di bingeha bêparkirina jinê de tedaxul û deşt biserde gritin hebûn heta ku pêşî ji wî mafî bê gritin. Heta îro xwandevaniya keçan sînûrên taybet bixwe hene, ji bo mînak ji aliyê malbatan ve bona xwedîna keçikan aştên taybet hatine deştînişankirin.

Di hin malbatan de, aşt xwandîna keçikan her ev devreya deştîpêkî deştînişan dîkin, ji ber ku li gor dûrbîniya xwe, li derheq xwendevaniya keçikan de pêngavek girîng havêtine û ji niha şûnda temenê karê mal û zewacê deştîpêkî kiriye û keçik xwe ji bo jiyana hevpar amade dîkin. Lê, hinek malbat lîseyê wek temenê dibistînanê dihesbînin. Ji ber ku ji dîtingeha wan di wî temenî de keçik heta aşt hewce mezin bûye û dibe bona çihgritina di rewşa jiyana

hevpar de amade bibe û eger berdewamkirina xwandîna bê çareserkirin hewcehî bi îzin vergirtina ji hevjinê xwe heye. Lewma eger keçên di demên cuda de heta eger di halê bideşt xistina zanîna de bin jî, bi aştengan re rûbirû dibin ku dikare ji wan re komên tûndtîjîya nerim were gotin.

Ji aliyek din ve ev gotina ji bo deştîyek din ji malbatan re û bi şewazek din, dibe ku deştîngî ji bo berdewamkirina xwandîna, heta bo xwandîna deştîpêkî jî bibe aşteng, aliyek berfireh ku li ser hîzrê bandor dadîna û rê ji bo paşerojê gelek teng dike, dikarin bêjin deştîngîya malî ye dibe sebeb qutbûna zanîna û hînkirina keçikan û heta xortan jî, di paşerojê de deştîngîya çandî û jîngehî jî ji bo jinan û dayîkan de li pey xwe hebe ku, dibe li ser perwerdehiya zarokan bandordar be.

Bêparbûna jinan tenê di mijarên hatînî behskirin de nayê berhevkirin, mirovê ku li ser laşê xwe de ewqas biryarder nebe yanî ji reh û bingehe de xwediyê bêparbûnê ye, weke neteweyek deştî û lingê wê kelemçekirî bin dimîn e, bona serbestiya xwe ji Dêw û zencîrê şoreşek radîkal û bi bê cudahîdanîna dixwaze da ku, vê rêza cudahîdanîna bitepisîne. Bilî ji wan soz û qewlan, çiqas deştîlatdariya binge-hîn li ser laş û jiyana bo jinan û keçikan, ji aliyê serweriya tewav a malbat, dewlet û civakê ve li der-

heq daxwazkariyên jinan ve devê xwe qermiçandiye ku, tenê rêbaz û dîzayîna cudahîdanîna reform dike û diguherîne.

Lê, şîpela cudahîdanîna li dijî jinan bi danîna perdeyan an laçike(xwayk) rûyê çavkaniya lawaziya civakê berfirehtir dibe û ev arîşe û birîna digel pêşkevîna demê giraniyek zêdetir jixwe digire. Herçawan ku îro bi awayek baş diyare, netenê cudahîdanîna îro liçav yê duh kêmîr nebûne belkû çarçoveya bandordanîna wê digel pêşkevîna demê ber bi başbûna di çarçoveya xuya de li halê daqurtadîna mînakên cuda ji tunebûnê ye.

Di civaka me de tev behsa wan arîşeyan dîkin ku, di nav tevgerê de tevli xwîna pêşketinê bûne û ev ji çalakbûnê ragirtiye lê, gelek kêm dîtingeh hene ku deştîna xwe li ser koka wan pîrsgirêkan danîbin.

Reha pîrsgirêkên ku sêkoçkeya jinê, cografîya û jîngehê pêkive girê dide di raştîyê de, reheke ku tevahiya birînan heyî digel vê homojeniyê ne. wan sê kategoriyên herî zêde ji zihniyeta mîr-salariyê bandor girtine ku, beşek ji bextreşîya hatî gorê, li ser vê zihniyeta jî bandor kiriye, lê, di esasê de tev bêbextî jinê jixwe digre, her ji ber vê yekê jî, di raştîyê de di dorpeça bo jiyankirinê cih girtiye. Dorpeça ku li ser navê tunebûna nasnameyeke dûr û dirêj jixwe girtiye..

ROMANA MEHMED UZUN A YEKEMÎN (TU)




N: Lokman Polat

Heger mirov bi gelemperî binêre romana kurdî a yekemîn ji aliyê Erebbê Şemo ve hatiye nivîsîn. Lêbelê heger mirov wek herçar parçeyên Kurdiştanê li romana kurdî binêre, li bakurê Kurdiştanê romana pêşîn Mehmet Uzun nivîsiye. Li başurê Kurdiştanê Îbrahîm Ehmed, li rojhilatê Kurdiştanê rehîm Qazî û li rojavayê Kurdiştanê bavê Nazê nivîsiye. Ez ê divê gotara xwe de behsa romana yekem a romannivîser Mehmet Uzun bikim.

Gorbihişt Mehmed Uzun nivîskarekî kurd ê hêja bû. Berhemên wî ên edebî û herweha hemû romanên wî dewlemendîya edebîyata/wêjeya kurdî ye. Romana wî a bi navê "Tu" li bakurê Kurdiştanê romana kurdî a yekem bû. Dema ev romana yekem li Swêdê hate weşandin, digel ku keyfa gelek xwendevanên kurd hat jî, hinek kesên hesûd û çavnebar li ser navê rexnegiriyê, rexnekuji kirin û gelek rexneyên ne di cî de, rexneyên pûç û vala li romana Mehmed Uzun kirin û li seksîyeta wî neheqî kirin, heqaret kirin.

Di dema çûyî de, gelek nivîsên rexneyî ên neheq di kovara "Dugir" û "Nûdem"ê de û di rojnama "Armanc"ê de hatin weşandin. Du sîyasetvanên ku di sîyasetê de bi ser neketibû û tîk çûbûn, bela xwe di Mehmed Uzun de dan û rexneyên nebaş lê kirin. Helbet Mehmed Uzun bersiva wan da û li dijî rexneyên wan ên neheq derket. Tiştên ecêb jî hinek kesên ku bi tirkî dinivîsandin û xwedêgiravî xwe rexnegir dihesibandin wan jî li Mehmed Uzun rexne dikirin.

Sîyasetvanekî teorîsyen ê



sîyaseteka kurd (ku her tim bi tirkî dinivîsî û fêrî zimanê Swêdî û Îngilîzî bûbû lê, fêrî kurdî nebûbû) li Mehmed Uzun rexne digirt. Ev sîyasetvan bi tirkî helbest jî nivîsibû û weşandibû. Tirkî nivîsîn ji edebiyata tirkan re xizmet e. Bi farisî û Erebbî nivîsîn jî ji edebiyata farisan û Ereban re xizmet e. Werhasil ez dirêj nekim, ew dem gelek neheqî li Mehmed Uzun hate kirin.

Ez di vê nivîsa xwe de dixwazim derbarê romana Mehmed Uzun a yekem "Tu" de binivîsim. Ev roman paşê li tirkî jî hate wergerandin. Piraniya romanên M. Uzun romanên biyografîk in. Di romana wî a bi navê "Bîra Qederê" de Celadet Bedirxan heye. Di "Sîya Evînê" de Memduh Selîm beg heye. Di rojek ji rojên Evdalê Zeynikê de Evdalê Zeynikê heye. Di "Ronî mîna evîna Tarî mîna mirinê" de Cem Ersever heye. Û di "Tu" de jî Mehmed Uzun bi xwe heye. Romana wî a dawî "Hawara Dîjlê" romaneke postmodern e. Heger wî ji ber nexweşiya penceşêrê zû koç nekira û neçûya li ser heqiya xwe, wî dê hêj gelek romanên hêja û serketî binivîsandana.

Romana Mehmed Uzun "Tu" di sala 1985'an de derketibû. Romana "Tu" a bi kurdî du car hate çap kirin, lê wergera wê a bi tirkî panzdeh car hate çap kirin. Wergêrê romana "Tu" Selîm Temo ye. Selîm Temo nivîskarekî kurd e û gelek berhemên wî ên bi kurdî û tirkî hene.

Naveroka romanê derbarê girtîyekî kurd (ku ew girtî Mehmed Uzun bi xwe ye) û tenêtiyê de ye. Ji xwe sedî nodên kurdan ji ber sedemên cuda piranî jî ji ber sedemên sîyasî ji aliyê dewleta dagîrker a Tirkan ve hatine girtin û ketine heps û zîندان. Gelek sîyasetvan, rojnamevan, edebîyatvan, rewşenbîr û nivîskarên kurd hatine girtin, di heps û zîندان de razane. Mehmed Uzun jî hêj di xortaniya xwe de ji ber sedemên sîyasî tê girtin û di hepsixaneyê Amedê de radizê. Lehengê romanê di zîndanê de, bi tenê ye. Kêzhatunek dibe hevala wî. Ew ji xwe re bi Kêzhatunê re diaxife, dipeyive.

Girtîyê zîndanê ji kêzhatunê re dibêje: "Ez êsir/dîl/ke-time, di zîndanê de me. Lê, tu ne esîrî. Tu mêvanê min î. Tu di tenêtiya min de bûyî dost û hevala min. Erê Kêzhatuna delal, tenêti zor e, zehmet e."


Romana "Tu" ji yazdeh beşan pêk tê. Di beşa yekê de li zîndanê û dîtina kêzhatunê û pê re hevaltî tê qalkirin. Di beşa duyem de bi zîmanekî edebî pîşniyara meh û demsalan û bi taybetî jî demsalên Havîn û Zivîstanê û di zivîstanê de girtina lehengê romanê tê rave kirin. Di beşa sêyem de jî axaftina lehengê romanê ê girtî ku di zîndanê de ye, bi kêzhatunê re didome. Beşa çaran de rave kirina qomser û polîsan a li ser mala leheng, sehkirina malê, girtina leheng û minaqeşeyên di nav leheng û qomserê nezan ê zircahil de

hene.

Lehengê romanê anku girtiyê di zîndanê de, serpêhatiyên xwe, bûyerên ku hatine serê wî, ji kêzhatunê re qal dike, ew bi xwe bi kêzêkê re diaxife. Vebêjê romanê, di beşa pênc de, ji kêzhatunê re destana Memê Alan dinirxîne. Ew herî pir ji çîroka "Mem û Zîn"ê hez dike. Di beşa şeşan de lêpîrsîn û lêdan, şkenceyên ku li lehengê romanê hatine kirin bi tîr û tijî ango bi berferehî tê qal kirin. Beşa heftan de dîmenên ji bajarê Amedê/Diyarbakirê, darvekirina Şêx Saîdê nemir û dîmenên bajarê Amedê hene.

Xwendevanên ezîz, min derbarê heft beşan de, agahdarî da we. Min bi kurtahî behsa heft beşan kir. Ez ê behsa naveroka beşên din nekim. Bila ew jî wek meraq bimîne, xwendevan meraq bike, ka gelo di wan beşan de çi hene û pirtûkê bikire û bixwîne. Lêbelê derbarê wan beşan de ez vê bibêjim; di wan beşan de tiştên baş û xweş hene, nivîskar û rewşenbîrên kurd hene. Hêja Mehmed Emîn Bozarslan, Îsmail Beşikçi û gelekên din hene.

Romanên Mehmed Uzun û hemû romanên romannivîserên kurd serbilindîya romana kurdî û dewlemendîya wêjeya kurdî ne. Romana hêja Mehmed Uzun a bi navê "Tu" digel ku romana wî a yekem e, romaneke serketîye û hêjayê xwendinê ye.



Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Li girtîgeha Êvînê Çar tiliyên girtiyeke birîn

Girtiyeke siyasî yê berê û çalakvanê mafê mirovî “Areş Sadiqî” li ser rûpela xwe ya Twitterê, bas ji birîna çar tiliyên girtiyeke li girtîgeha Êvîna bajarê Tehranê kiriye.

Herwisa wî girtiye siyasî nivîsiye: “Roja 10`ê Cozerdanê li bêhdariya girtîgeha Êvîna Tehranê bi tawana dizîkirinê, çar tiliyên girtiyeke hatine birîn.

“Areş Sadiqî” ti îşareyek bi nasnameya wî girtiye nekiriye, lê nivîsiye: “Ew kesê ku cezayê qutkirina çar tiliyên wî li bêhdariya girtîgeha Êvînê hatiye cîbicîkirin, ji girtîgeha bajarê Kirmaşanê bo girtîgeha Êvîn (benda 7) hatibû veguhaştin. Ew girtiye siyasî di berdewamiyê de nivîsandiye: “Ew ceza di bin çavedêriya tund a ewlehî li bêhdariya girtîgeha Êvînê de hatiye cîbicîkirin.

Herwisa sê girtiye din ên bi navên “Hadî Roştêmî, Mehdî Şerfîyan û Mehdî Şahîvend” bona cîbicîkirina cezayê qutkirina tiliyên destên wan li girtîgeha bajarê Urmîyê, bo girtîgeha navendî ya bajarê Tehrana mezin hatin.

Rêkevtimeyên navnetewî bona pêşgirtin ji êş, îşkence, mafê medenî û siyasî, cezayên nemirovî wekî qutkirina endamên ceste-yî qedexa kiriye, lê Îranê heta niha ew rêkevtimeyên konvasiyona navnetewî ya pêşgîrî ji îşkenceyan wajo nekiriye.

Îbrahîm re`îsî serkomarê niha yê Îranê, berê di demekê de ku berpîrsê dezgeha dad a Îranê bûye, qutkirina dest bi “şanaziyeke mezin a nîzamê” nav birîye.

Hejmarek ji çalakvanên sinfî yên mamosteyan dest avêtin bi gireva birçîbûnê

Roja Pêncşemî 12`ê Cozerdanê, hejmarek ji çalakvanên sinfî yên mamosteyan bi nîşana nerazîbûn ji binçavkirina mamoste û dosye sazî li dijî wan û herwisa bi armanca piştevanîkirin ji “Eskender Lutfî”, berdevkê şiwra hevahengîkirina saziyên sinfî yên çandî yên Îranê dest avêtin bi gireva birçîbûnê.

Wan çalakvanên sinfî li mala xwe de dest avêtine gireva birçîbûnê û ragihandine ku heya xuyabûna qedera “Eskender Lutfî” em dest ji gireva birçîbûnê ber nadin.

Roja Duşemî 9`ê Cozerdanê, “Eskender Lutfî” endamê birêveberiya Encûmena Sinfî ya Mamosteyên Kurdistan-Merîwanê, bi nîşana nerazîbûn li derheq berdewamiya binçavkirin a neyasayî û givaş xîstina li ser wî bona vergritina îtirafa bi zorê, dest avêtine bi gireva birçîbûnê.

Hêzên ewlehî “Eskender Lutfî” xîstine bin givaşan da ku bi hebûna peywendiya digel du welatiyên Firansî yên binçavkirî, ji aliyê Wezareta Îtîla`atê ve îtiraf bike.

Li bajarê Kamêranê welatiyekî Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin

Roja Çarşemî 11`ê Cozerdanê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Xalid Qurbanî” temen 26 salî, kurê Yûsif û xelkê bajarê Kamêranê, rûniştîyê bajarê Sineyê ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyên yasayî ew welatî li bajarê Kamêranê binçav kirine. Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, navbirî bona lêpîrsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Sineyê hatiye veguhaştin. Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku li dijî “Xalid Qurbanî” hatiye sepandin, ti zanyariyek ber dest nîne.

Li bajarê Merîwanê jinek Kurd bi xwe lidarvekirinê dawî bi jiyana xwe anî

Roja Duşemî 9`ê Cozerdanê, jina kêma temen a bi navê “Şukiriye Pejûhî” keça Mihemedsalih xelkê gundê “Baywe” û rûniştîyê bajarê Merîwanê, dawî bi jiyana xwe anî.

Çavkaniyeke agehdar ji nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihandiye: “Ew jina kêma temen bi sedema pîrsgirêkên malbatî, dawî bi jiyana xwe anî ye”.

Pêka gotina wê çavkaniyê, “Şukiriye Pejûhî” ji rêya xwe lidarvekirinê dawî bi jiyana xwe anî ye.

Navbirî dayîka zarokekê ye.

Wêneyên salroja cîhaniya Zarokan

